Jineke çeleng û dayikek fîdakar

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Em du heval bûn. Ez û Elî. Hema ji roja yekê metanet û hurmeta wî ji min ra balkêş bû, lê tim di nêrînên wî da min hinek tiştên negotî hiss dikirin. Carna kin û kurt li ser jiyana xwe diaxivî, lê dema tem û mija xemên berê esmanê dilê wî dadigirt, milê min digirt û bi keneke pir sirûştî digot**:“ de ka tu bi Xûdê stranekê bêje....“** û min jî bi dengê xwe yê nexweş jêra straneke şehîd Mizgîn jêra dixwend:**“ Lo şivanooo... ev çend sale, tu digerî li van çiyan..., ka ji min ra bêje kar û barê wan hevala li serê çiyan....“**.

Piştra em bûn komek û evîna me teva yek bû. Li bakur dengekî xweş û nû dihat. Me teva berê xwe dabû wira. Hinek wefadar man û hineka jî zû kirasê xwe gûherîn, her roj bi sazekê direqsîn û bayê tekeburê ket pozê wan. Min tim dixwest ez hevalên xwe û detayên jiyana wan bi berfirehî bizanîbim. Çi tiştê ku di tûrkê min da hebû, min bi awayekî semîmane ji wan ra digot. Carna dema mirov mêdek(sifr)a dilê xwe ji kesên nêzî xwe ra vedike, xwe barsivik dihesibîne û kesekî hevalê xem an jî şahiyên jiyana xwe dibîne. Xwe bi tenê hiss nake. Elî ji min ra hevalekî wiha bû. Pak û semîmî, dosetekî rast û durist, bê tekebur û rûrast bû. Hinek sifetên wî yên taybetî bûn sedem ku hevaltî an jî dostaniya me heya roja îro bi germiya rojên destpêkê, berdewam be.



Rojekê ez çûm mala wan û dayikek hêja çawa ku Elî maç kir, weke kurê xwe ez jî maç kirim. Ev çand di nava Kurda da xwedî dîrokek dûr û dirêje û li hemberî tofanên giran sebebekî mayîna me Kurda ye. Bi qasî dayika xwe min jê hez kir.
Rûyê wê tim bi ken bû. Ji çavên wê muhebeta dayikeke dilovan dibarî. Gotinên wê wisa nerm û helîm bûn ku te bixwesta-nexwesta neçar bûy hurmeta wê bigirî. Serbihûriya wê romaneke nenivîsandî ye. Elbete ger **„ Maksîm Gorkî“**yekî me hebûya yê çîroka jiyana wê jî bikira romaneke dîrokî.

Gelek cara min jê daxwaz kir ku li ser jiyana xwe ya salên berê, li ser jiyana penaberî û salên der bi deriyê, li ser êş û elemên tenê mayînê, torekirin û xwedîkirina zarokên sava, li ser wefadariya ji hevalê xwe yê qehreman û mêrxas ra û li ser gelek tiştên din ji in ra biaxive, lê tim wiha digot**:“ kurê min dilê**

min dayax nake… ez nikarim behsa wan salên reş bikem. Tev nexweşî û rojên nexweş bûn. Ez çi bêjim, çinebêjim law….?" û li pey wê jî **„dayê“** çavên wê tejî dibûn û bêdeng dima.

Dayê tim bi wê heseretê dijî ku rojekê azadiya Kurdistanê bibîne. Di salên dawiya jiyana xwe da azadiya pareke axa welatê bindest dît û ez bawerim bi dilekî rihet xatra xwe ji jiyanê xwest.

" Kesê yekê ji aliyê çepê: şehîd Elî Halo bi nemir Mistefa Barzanî ra "

Ew hê genc bû ku hevalê wê (Elî Halo) şehîd bû. Li pey wê zêdetir ji 45 salan li kêleka kurên xwe û weke mezineke malbatê liyaqet û hurmeta xwe ya bilind ji herkesî ra îspatkir. Di çanda me Kurda da ji van jinan re **„serejin û xanim“** tê gotin. Yanî jinên ku serekêşiya jinên malbat an jî herêmekê dikin û wek nimûne tên nîşan dan. Jinên wiha bi gotin û karê xwe bûn sedem ku axaftina**“ şêr sêhere, çi jine çi mêre...“** bikeve nava çanda Kurda.

Min li ser mîrasê jinê di parastina huner û ferhenga me Kurda da gelek cara nivîsandiye. Dema min xebera wexera dawiyê ya dayika **“Pîroz Halo“** bihîst, wefadarî û sed sifetên wê yên mirovhezyiê hatin bîra min. Hêşat jî dengê wê yê daykane di guhê min daye:**“ Kurê min çi pirsgirêk nînin ku çareser nebin, gere hûn mêr bin û ji bo standina mafên xwe kar û xebatê bikin...“**

Dayika me ya çeleng Pîroz tim bi hesreta azadiyê dijî. Şîretên wê ji bîra min naçin. Wê digot:**“ Tiştek ji wê hindê xweştir nîne ku mirov bi serbilindî bijî. Navê baş hemû malê dinê tîne...“**

Birastî hevalno em tev deyndarên torekirin û şîretên dayikên xwe ne. Wan axa me bi me da nasandin. Wisa kirin ku em ji axa xwe hez bikin û canê xwe jêra bikin qûrban. Dayikên mîna wê xwedî rolekî mezinin ku em bibin evîndarên azadî û ramana azad. Belkî tenê ev ji mera bes be ku bi dayikeke weke „Pîroz“ê serbilind bin û hêzeke nû di hestên me da biafirîne. Ez tenê bi vê ra dikarim xema dûriya dayika xwe tehemûl bikem. Min

tim ew ji xwe ra dayikeke hêja û ezîz dihesiband. Ew jineke çeleng û ji me tevan ra pir fîdakar bû.

Bi hemû hestên xwe ji hevalê xwe yê hêja ra dibêjim:“ Elî can bila serê hemû kurên ku xwedî dayikeke weke diya tene, sax be. Ez xwe hevalê xema te ya giran dihesibînim.

28. 11. 2009 Elman